**Gastroscope (n.)** / ûrkbîn, aşikbîn / gastroskop  
**Gastroscopic (adj.)** / ûrkbînî, aşikbînî / gastroskopî  
**Gastrotomy (n.)** / hûrqelaştin, aşikqelaştin / mide ameliyatı /  
**Gather (v.)** / berhev bûn, kom bûn, vehewîn / topla(n)mak  
**Gauge (n.)** / pîvan / ölçü, kalibre  
**Gauge (n.)** / pîvik / ölçü, ayar  
**Gauge (v.)** / pîvan / ölçmek /  
**Gauntlet an(a)esthesia, glove** an(a)esthesia / hestbetaliya lepikî / eldiven anestezi  
**Gauze (n.)** / paçika kitan, çarık, kitan / gazlı bez, tül  
**Gauzy (adj.)** / kitanpaçikî / tül gibi /  
**Gavage (n.)** / bi sonda xwedî kirin / lastik sonda ile besleme /  
**Gay (adj.)** / qûnek, qûnde / sevicî, cinsel tercihi erkek olan erkek  
**Gelatin(e) (n.)** / jelaîn / jelatin, tutkal hulasası /  
**Gelatinous (adj.)** / jelaînawî / jelatinli, jelatin gibi /  
**Geminal (adj.)** / duberî, cêwî, cot pêkhînan / çift oluşturan, ikiz  
**Gender (n.)** / zayend / cinsiyet  
**Gene (n.)** / gen, cin / gen  
**Genealogical (adj.)** / nijadî, ezbetî / şecere, soya ait, soy ağacına ait /  
**Genealogically (adv.)** / bi ezbetî / nesep şeceresi bakımından /  
**Genealogist (n.)** / ezbetnas / soy uzmanı /  
**Genealogize (v.)** / ezbetnasî bilîn / soy tetkiki ile meşgul olmak /  
**Genealogy (n.)** / cîsn, cure, dundan, dûnde, ezbet / soy, şecere\*

**Genera (n.)** / zayendan, cîsnan / cinsler,neviler /  
**General (adj.) (n.)** / giştî, gelemper, sertîp, gişkî, giştî, herkesîn, mîrliwa / genel  
**General an(a)esthesia** / hestbetaliya giştî, hestkgujiya giştî / genel anestezi  
**General practitioner** / bijîşkê giştî, bijîşkê sepînerê giştî / pratisyen hekim, genel uygulayıcı hekim /  
**General rule** / rêzika giştî / genel kural /  
**Generality (n.)** / t'omerî, giştî / genellik, çoğunluk  
**Generalization (n.)** / gelemperîkirin, giştîkirin / genelle(ş)me (yapmak) \*  
**Generalize (v.)** / gelemperî kirin, belavbûy bûn, giştî kirin, berbelav kirin / genelleştirmek, hastalığı genel bir hale koymak, yayılmak /  
**Generally (adv.)** / bi gelemperî, bi tevayî, bi gişkî, bi pirranî / genel olarak, genellikle, genelde  
**Generate (v.)** / afirandin, zayîn / doğurmak, üretmek, oluşturmak  
**Generate (v.)** / pêk anîn / oluşturmak, meydana getirmek  
**Generation (n.)** / helhênîn, helhênan, neve, nifş, zaye, babik, pişt, cîl, nifş, govek, qirn, bavik, binaçe, dûdeman, şûtik / nesil, kuşak  
**Generation (n.)** / zayîn, jidayikbûn, afirîn / doğurma, yaratma  
**Generative (adj.)** / bergir, biber, berdar / üretken, üretici  
**Generalization (n.)** / belavbûyî kirin / yaygınlaş(tır)ma  
**Generic (adj.)** / gişk, zayendî, gelemperî, giştî, tevayî / genel, cinsle ilgili /  
**Genesis (n.)** / pêkhatin, çêbûn, qewimîn, bûn, dezgeh, sazî / oluşum, meydana geliş  
**Genesis (n.)** / peydabûnê, çêbûn / oluşum, oluşma, meydana gelme  
**Genetic (adj.)** / cinasî, paşmakîti, paşmayîti / kalıtımsal, kalıtsal  
**Genetic (adj.)** / rakendî, cinasî / kalıtsal, kalıtımsal  
**Genetic defect** / 'udra cinasî / kalıtsal defekt, kalıtsal bozukluk /  
**Genetic heritage** / jêmayîya cinasî, paşmakiya cinasî / kalıtsal miras, kalıtsal kalıt, kalıtsal miras /  
**Genetic inheritance** / beşbira paşmak / genetic veraset, kalıt, kalıtsal geçiş

**Genetic(al) (adj.)** / paşmakî, cinasî, zikmakî, dîrokî, nijadî / aslına ait, genetik, kalıtımsal  
**Genetically (adv.)** / bi rakendî, bi cinasî / kalıtımsal olarak, genetik olarak /  
**Geneticist (n.)** / paşmayîzan, cinaszan / kalıtım bilimci  
**Genetics (n.)** / cinasîzanî, paşmayîzanî, pêmayîzanî, nijad, pêkhatina zikmakî, zikmakzanî, paşmayînasî / kalıtım bilimi, soyaçekim, heredite  
**Genic (adj.)** / cînî, zikmakî / gensel  
**Genic (adj.)** / ra, rayek / köken, menşe /  
**Geniculate(d) (adj.)** / çemandî (tîj), çongawî / diz gibi, diz gibi bükülmüş, dizli /  
**Genie (adj.)** / xweder, jêderk, jêza / menşeli, kökenli  
**Genital (adj.)** / zayînî / cinsel  
**Genitalia (n.)** / ewzên zayînî / cinsel organlar  
**Genitally (adv.)** / bi zayendî, zayendkî, zawzêkî / üreme ile ilgili olarak, cinsel olarak  
**Genitals (n.)** / şermecê, endamên zayendî (regezî), ewzên zawzê, endamên ganînî / üreme organları, cinsel organlar  
**Genito (pref.)** / zayend / cinsel organlara ait /  
**Genitourinary (adj.)** / zawzêûrêmîzî / cinsel ve idrar yollarına ait /  
**Genotype (n.)** / cinetexlît, binyata rakendî, binyat yan nimûneyê zikmakiya mirovekê yan birrekê, nimûneyê tuxmî, çînek yan birrek mirov kgu pêkhatiyek zikmakî taybetî hene / genetik özellikler, kalıtsal yapı  
**Gentle (adj.)** / nazenîn / kibar, hafif, yumuşak, nazik /  
**Gently (adv.)** / bi nermî, hêdîka / kibarca, yumuşak bir şekilde, yavaşça, nezaketle /  
**Genu (n.)** / çong / diz  
**Genu varum, bowleg (n.)** / kevanig / yay bacak  
**Genuine (n.)** / rast, rastîn, rasteqîn / gerçek, hakiki  
**Genus (n.)** / regez, çîn, texlît, cor / cins, nevi  
**Geo (pref.)** / erd, erdîn / yer

**Geographic (adj.)** / erdnîgarî, erdnasî / coğrafya ile ilgili  
**Geographical (adj.)** / erdnigarî\* coğrafya ile ilgili  
**Geography (n.)** / erdnigarî / coğrafya  
**Geriat(r)ic (adj.)** / phîrbûnî / yaşlıların sağlığı ile ilgili  
**Geriatrician (n.)** / pîrbûnîzan, pispor yan pijîşkê pîrîtiyê / yaşlılık hastalıkları uzmanı  
**Geriatrics, geriatry (n.)** / pîrbûnîzanî, pijîşkiya pîrîtiyê / yaşlılık sağlığı uzmanlığı  
**Geriatrics (n.)** / zanistiya nexweşiyên phîrî\* yaşlılık hastalıkları uzmanı  
**Geriatrist, geriatrician (n.)** / pîrbûnzan, pijîşk yan pisporê pîrîtiyê / yaşlılık hastalıkları uzmanı  
**Geriatry, geriatrics (n.)** / pîrbûnîzanî, pijîşkiya pîrîtiyê / yaşlılık sağlığı uzmanlığı  
**Germ (n.)** / dirm, dirme, tov, mîkrob, zindîlok, xore, toke, cîn / mikrop (bakteri, virüs), tohum, tohumun özü  
**Germ cell (n.)** / xaneyaya dirm, şanetov / mikrop hücresi, tohum hücresi  
**Germ measles, rubella** / sorikên elmanî, sorikok / alman kızamığı, kızamıkçık, rubella  
**Germicidal (adj.)** / hûrzindîkgujî, zindîlokgujî / mikrop öldürme ile ilgili  
**Germicide (n.)** / zindîlokguj / mikrop öldürücü, antiseptik  
**Germinal (adj.)** / tovî, avlimeyî, awlimeyî, zikmakî, pizkî, afirinî / tohuma ait, çimlenmeye ait  
**Germinal vesicle** / tovdanka pizî / tohuma ait kabarcık  
**Germinate (v.)** / aj dan, kat dan, zîl dan / filizlenmek, bakterilenmek(spordan)  
**Germplasm (n.)** / plazma zindîlokan, cîn / mikrop plazması, gen  
**Geronto (pref.)** / kgalûphîrî / yaşlılıkla ilgili  
**Gestagen (n.)** / madeyek hormonî wek hêkkirinê ye / yumurtlama hormonu  
**Gestagenic (adj.)** / pêwendidarê madeyê horimoneyê wek hêkkirinê / yumurtlama hormonuna ait  
**Gestation (n.)** / ducanî, avisî / gebelik  
**Get (v.)** / bi dest xistin, stendin, girtin, wergirtin / elde etmek, almak



**Get a good result** / encamek baş stendin, encamek baş wergirtin / iyi bir sonuç almak / me ji vî dermanî encamek baş wergirt  
**Get better** / baştir bûn, hîn çê bûn, çêtir bûn / daha iyi, iyileşmek  
**Get caught up in an epidemic** / bi éşé ketin, bi nexweşiya perokî ketin / salgın hastalığa yakalanmak  
**Get dark (v.)** / reşevêhatin, reş bûn, tharîbûn / koyulaşmak, kararmak  
**Get encrusted with sleep** / şîlaq girtin / çapaklanmak  
**Get herpes**, develop cold sores (v.) / pelepûç(i)k derxistin-dan / uçuk çıkarmak, uçuklamak  
**Get opportunity**, make an opportunity, find opportunity / kês pê anîn-hatin-xistin, fersend dîtin, keys pêxistin / fırsat görmek-elde etmek  
**Get out of coma** / ji qomayé derketin / komadan çıkmak  
**Get out of hand** / ji çavdêriyê derketin / kontrolden çıkmak (durumun kontrol dışına çıkması)  
**Getting old**, aging / phîr bûn, kgal bûn / yaşlanmak /  
**Getting popular** / bûn nasyar, bûn navdar / popülerleşmek \*  
**Geusia (n.)** / çêj, çejnî / tat  
**Giant (n.) (adj.)** / ejdeha, zebelah, zil, leşgirs, hût, efrîd, hefrîd, hûtendam, hû(o)tasa\* dev, iri, kocaman, dev gibi, çok büyük, koskocaman, devasa  
**Giddiness (n.)** / sergêjî / baş dönmesi / bûyera kgu ji serhişçûnê (bîrveçûnê) pêşengî kiriye sergêjiye  
**Giddy (adj.)** / sergêj / sersem, başı dönen, baş döndürmek  
**Gigantean**, gigantic (adj.) / ejdeha, zebelah, hûtasa, wek hûtan, pir mezin, gir, girs, gumreh, qerese, hûtî / kocaman, devasa, çok büyük  
**Gigantic**, gigantean (adj.) / ejdeha, zebelah, hûtasa, wek hûtan, pir mezin, gir, girs, gumreh, qerese, hûtî / kocaman, devasa, çok büyük  
**Ginea**, sheat, theca (n.) / kgalan, kgewdank, qewlik, qibûr / kılıf, kın  
**Gingival (adj.)** / pidûyî / diş etlerine ait /  
**Gingival enlargement** / mezinbûna pidûyî / diş etine ait büyüme

**Gingivectomy (n.)** / pidûhelkêşan, pidûderqelaştin / jinjivektomi  
**Gingivitis (n.)** / pidûkgulî, pidûkgulbûn, pidûkgulî / diş eti iltihabı  
**Girdle (n.)** / şalûşapik, piştik, şûtik, şeleme / kuşak, kemer, korse  
**Girdle**, corset (n.) / piştband, suxme, piştband / korse  
**Girl (n.)** / kgeç' qîz, dot, zerî / kız  
**Girlhood (n.)** / kgeçanî, kgeçîtî, qîzitî, qîzanî / kızlık çağı-dönemi  
**Girlish (adj.)** / wek kgeçan, kgeçkanî / kız gibi, kız işi  
**Girlly (adv.)** / wek kgeçan, kgeçane / kızlara göre  
**Give (v.)** / dan (ber, behrem hwd.), bexşîn, çîz kirin, herifîn, vegirtin / vermek, uygulamak  
**Give birth to**, bear (v.) / zayîn, welidîn, zan, razan, anîn dinyê, zayîn kirin / doğurmak  
**Give breath**, breathe out (v.) / bîn dan, bêhn dan-berdan, hilm dan / nefes vermek  
**Give over (v.)** / dev jê berdan, birrîn, sekinandin / bırakmak, kesmek, durdurmak  
**Give rise to** / sebebiyet vermek, neden olmak / bûn ho, bûn eger, bûn sedem  
**Give suck (v.)** / şîr dan / süt vermek  
**Give up**, cease form, abandon, change one's mind / letilandin, qeran, çîz kirin, berdan, dest-dev jê berdan, terikandin, dev jê berdan, çî kirin, dest jê kirin, tê borîn, tê bihurîn, jê qerîn, jê gerîn, dest jê kişandin ( wek ji de xwarina bêxwê bé berdan) / vazgeçmek, bırakmak  
**Giving access** / kapı açmak / derî vekkirin / birîn, ji bo derbasbûna hûrzindiyar derî vedike  
**Gkobe**, sphere, circle, orbit, ball, balloon, orb (n.) / govek, kad / küre  
**Glabella (n.)** / navbirû / kaş arası  
**Glabrous (adj.)** / bêmû / tüysüz, kılsız  
**Gland (n.)** / alo, alû, lo, toşp(b)î, livik, birzik, ginî, tîla / bez, gudde \*  
**Gland tear** / livika rondik, hêsir yan firmêskan / göz yaşı bezi  
**Glanders (n.)** / sîrace (yekbûn), hipilme, miqav, seqav, ufe / ruam hastalığı, ruam, sakağı  
**Glandular**, glandulous (adj.) / livikî, loyî, toşpiyî, hilhilankî / bezsel, gudde gibi, guddeye ait

**Glandularly (adv.)** / bi hilhilankî, toşbîkî / beze ait olarak

**Glandule(a) (n.)** / livikik, toşpîkik, lokik / bezcik, guddecik

**Glandulous**, glandular (adj.) / livikî, loyî, toşpiyî, hilhilankî / bezsel, gudde gibi, guddeye ait

**Glans (n.)** / seré kgîr, çimê gilikê / penis ucu, klitoris başı\*

**Glans penis (n.)** / serê kgîrî / penis başı-ucu

**Glass (n.)** / pîpok / cam

**Glasses (n.)** / gözlük / berçavk

**Glassy (adj.)** / wek pîpokê, pîpokok / cam gibi, camsı /

**Glauber's salt**, sodium sulfate / zaxa qilê / sodium sülfat

**Glaucoma (n.)** / avreşî, ava reş / glokom, göz tansiyonu, karasu hastalığı

**Glenoid (adj.)** / kiloriya (qama) hestî / oyuksu, çukursu

**Glia (n.)** / tevnê pêgirekê birikî / sinir boğumu dokusu

**Gliadin (n.)** / texlîtek pirotînê tovî (wek genimî) / gliyadin

**Glial (adj.)** / pêwendîdarê tevnê pêgirekê birikî / sinir düğümü ile ilgili

**Glisson capsule** / xaşeya glisson / glisson kapsülü

**Glisten**, glitter (v.) / biriqandin / parlamak, parıldamak

**Glitter**, glisten, (v.) / biriqandin / parlamak, parıldamak

**Globby (adj.)** / girûvir, gûvîşk / topak, yuvarlak

**Globe (n.)** / gog, govek, kad, gorver\* küre, top /

**Globin (n.)** / protîna hemoglobînî yan av xwînê / globin

**Globose (adj.)** / gogî / küre şeklinde, küresel\*

**Globular**, round, circular, spheric(al) (adj.) / xir, tepkî, gogî, girover / yuvarlak, küre şeklinde, küresel

**Globule (n.)** / gogik / küçük yuvarlak, kürecik

**Globulin (n.)** / protînê din av avê de dimînit / globulîn

**Glomerate (adj.)** / gilokî, bûye gac, gomcikî / yumak şeklinde, yumaklaşmış

**Glomerular filtration** / parzûnbûna gomcikî / glomerüler filtrasyon /

**Glomerular filtration rate** / leza dawerivandina gomcikî / glomerüler filtrasyon hızı

**Glomerule (n.)** / gomçik, gilok (işiyê endamên biçûk, tevn, demarên xwînê) / yumak (kısm)

**Glomeruli (n.)** / gomçikan / glomerüller

**Glomerulus (n.)** / gomçika biçûk, gilokik / yumakçık

**Gloss(o) (pref.)** / ziman / dil

**Glossal (adj.)** / pêwendîdarê zimanî, zimanî / dile ait

**Glossectomy (n.)** / ziman derqelaştin / dil ameliyatı /

**Glossitis (n.)** / zimankgulbûn, zimankgulî / dil iltihabı \*

**Glossodynia** / zimanêş / dilde ağrı

**Glossopyrosis** / zimansotin / dilde yanma

**Glossy (adj.)** / tevişok, birîskedar, çirîsî, sîqaldar / parlak ve düz, cilalı

**Glottal (adj.)** / gewrîkî, qirrikî / gırtlaksı, glotise ait /

**Glottis (n.)** / pûk, vekirina serê kirkirokî, devê zengilorê (yekbûn) / soluk borusunun ağzı (trachea)

**Glove (n.)** / lepik, destgork, t'etik, destane / eldiven

**Glove an(a)esthesia**, gauntlet an(a)esthesia / hestbetaliya lepikî / eldiven anestezisi

**Glucagon (n.)** / hormonek şêlavê ye, hormona di xwînê de şekir zede dike / kan şekeri yükselten hormon

**Glucocide (n.)** / glukoz çêker / şekir yapan  
**Gluconeogenesis (n.)** / nûve şekirê nişayî çêbûn, şekirçêkirin ve kî / yeniden şekir yapımı

**Glucose (n.)** / şekira tirî, şekira nişayî, şeraba nişayî / glükoz

**Glucose loading test** / şitela şekirbarkirin / şekir yükleme testi /

**Glue**, stick, paste (v.) / zeliqandin, tê xistin / yapış (tır) mak, sokmak, bağla (n) mak

**Glum (n.)** / pixudok, pixûdî, xulkoyîti, mirûzkiritî / somurtkan

**Glutamic acid (n.)** / tirşiya glotamînî / glutamik asit  
**Glutamine (n.)** / glotamîn / tirşiya emîniya belûrbûyî  
**Gluteal fold (n.)** / qurmiçika qûnê, qelîşteka qûnê / kalça yariği, kalça kıvrımı  
**Gluten (n.)** / pêz, hodar, debîş, glûten / gluten  
**glutinous (n.)** / Kemaxawî, kgulêmekawî / ilyeli, kaba ete ait, kaba etli (kalça) /  
**Gluteous maximus** / hêt / büyük kalça kası  
**Gluteous medius** / mitlok / orta kalça kası  
**Gluteus (n.)** / kgulêmek / ilye, kaba et, kalçanın üst kısmı /  
**Glutinosity (n.)** / stirkî kirin / glutenlilik  
**Glutinous (adj.)** / lincî, pêzdar, debîşî, stirkî / glutenli  
**Gluttonous (adj.)** / xure, xwere, xaşker, çirore, xwarok, ferexur, pirxwer, çilêz, hûrfilitî, hûr mezin, heftkun / obur, çok iştahlı  
**Glyc(o) (pref.)** / şeker / şeker  
**Glycer(a) (pref.)** / glîserîn, glîsrol / gliserin  
**Glycerin(e) (n.)** / avekiyek şirîn bêreng e, ji bezî bi sabûnkirinê çedikin bo melhemî û teqemeniyê / gliserin  
**Glycogen (n.)** / şekira cergî / depo şekeri  
**Glycogenesis (n.)** / çêbûna glîkojenî ji şekerê, şekerçêbûn / şeker oluşumu  
**Glycolic acid (n.)** / tirşiya glîkolî / glikolik asit  
**Glycolysis (n.)** / şikestina şekeran bi enzîman bo derînana wuzeyî, şeker hilandin / şeker eritme  
**Glycoprotein (n.)** / glîkoprotîn / glikoprotein  
**Glycosuria (n.)** / şekirmîz / idrarda şeker  
**Gnash (v.)** / zîqandin, sîqandin, qırçandin, çirikandin, sîqirandin (diran) / gıcırda(t)mak (diş)\*  
**Gnat (n.)** / vizik, pêşûle / tatarcık, sivrisinek  
**Gnath(o) (pref.)** / erzînk, rih / çene  
**Gnathic (adj.)** / erzînkî, rihî / çeneye ait  
**Gnaw (v.)** / kgerisandin / kemirmek  
**Gnawing (n.)** / kgerisvan / kemirici  
**Go (v.)** / çûn, herîn \* gitmek  
**Go in to a coma** / ketin qomayé / komaya girmek

**Go into coma** / ketin qomayé / komaya girmek  
**Go rounds** / serdan kirin / ziyaret yapmak, ziyaret etmek  
**Go unnoticed** / ji çav revîn / gözden kaçmak / dive ji bo nasanê mere tişteki ji ber cave xwe nerevîne  
**Goal (n.)** / armanc, kam, nîşan, mebest, serdil, merem, qesd, nêt, miraz / amaç, hedef  
**Goat's milk ane(e)mia** / bêxwîniya şîrê bizinê / keçi sütü kansızlığı  
**Goiter, goitre (n.)** / girep, perîzade / guvatır \*  
**Goitered, giotrous (adj.)** / girepdar / guvatırı olan, guvatıra ait /  
**Goitre, goiter (n.)** / girep, perîzade / guvatır \*  
**Gold (n.)** / zêr, parçediravên zêr / altın  
**Golden (adj.)** / zêrîn / altın renginde  
**Golden yellow** / zer, zêrîn, zera zêr / altın sarısı  
**Golgi apparatus ( )** / beşenoka golgî / golgî cisimciği  
**Gon(o) (pref.)** / zêyî / üreme  
**Gonad (n.)** / ewzên zêwza, endamên zayendê, gan (inglîzî de jî were ye, ganîn li ser wateya tékiliya zayendîye=çiftleşme, sex yapma) / üreme organları, cinsel organlar  
**Gonad (n.)** / livikek zêyî ye / üreme organı-bezi  
**Gonorrhea (n.)** / sûsenek, sûzenek (wateya bêjeyê ji ewzên ganîne herik pêhatiniye)\* bel soğukluğu (kelime anlamı gonadlardan (üreme organları) akıntı gelmesidir)  
**Good (adj.)** / baş, çak, çê, xoş, xweş, rind, qenc, bêr, çeleng, xawên, saz, sax / iyi  
**Goodness (n.)** / çakîti, başîti, xaseki, qenci, rindayî, rindî, xoşî, xweşî, xêr, çêyî / iyilik  
**Gout (n.)** / nexweşiya gûtê / gut hastalığı /  
**Goutiness (n.)** / gûtî / gutluk, gut hastalığına tutulma /  
**Gouty (adj.)** / bigût / gutlu, damla hastalığıyla ilgili /  
**Gradate (n.)** / pile, pêlik / derece, mertebe /

**Gradation (n.)** / pèlik pèlik, gehînek / derece derece deđişme-çıkma, merhale /  
**Gradational (adj.)** / pèlikî, gehînekî / derece derece, tedrici /  
**Grade (v.)** / gehînek kirin / derecelendirmek, sınıflandırmak /  
**Grade, degree (n.)** / pîle, niqir / derece  
**Grade, degree (n.)** / qonax, bêlan, gihanek / aşama, evre  
**Grade, degree, (n.)** / rade, perese, dang, ast / seviye, düzey  
**Graded (adj.)** / gehînekkirî / derecelendirilmiş /  
**Gradient (adj.)** / gehînekdar / derece derece deđişen /  
**Grading (n.)** / pilebûn, gehînekbûn / derece, kademe /  
**Gradual (adj.)** / berebere, guva guva, piço piço, bere bere, niqir niqir, hino hino / derece derece, aşamalı, tedrici, aşama aşama, yavaş yavaş /  
**Gradually (adv.)** / berebereyî, bi berebereyî, pile pileyî, kèlî (bi) kèlî, bere bere, gav bi gav, her diçe, hêdî hêdî / tedricen, aşamalı olarak, tedrici olarak  
**Graduate (v.)** / pile kirin, berebere kirin / derecelendirmek, derecelere ayırmak-ayrılmak, tedricen deđişmek /  
**Graduated (adj.)** / piledar, telan, qonaxbûyî, gîhanekbûyi / dereceli, aşamalı, derecelere ayrılmış  
**Graduating (n.)** / pilekirin, pilebûn / dereceleme  
**Graduation (n.)** / pilebûn-kirin, derçûn / derecelen(dir)me, tedricen deđişme  
**Graft (n.)** / patrome, lûl, fetrûm, taman / aş, yama(doku), greft  
**Graft (n.)** / pine / yama, greft  
**Graft (transplant) (v.) Patrome kirin, lûl kirin, tamandin, taman kirin\*** aş yapmak, greftlemek, greft yapmak, doku yerleştirmek, aşılamak, aşılanmak  
**Grain (cereal) (n.)** / zad, dexl / tahıl, hububat  
**Grain (n.)** / gerdîle, lib, dëndik, dan, dane (hebê zad) / tane, habbe, parça, zerre (hububat tanesi)  
**Grain (n.)** / tov / tohum  
**Grainy (adj.)** / hebî, biheb / taneli  
**Gram (n.)** / tixt / gram

**Gram or gramme (n.)** / gram, tixt, hezaryek (1/1000) (yek ji hezar gramê, yek ji kîlogramekê) / gram, kilogramın binde biri  
**Gram or gramme atom** / kêşe gerdîleya gramî / atom ağırlığı  
**Gram or gramme molecule** / kêşa pirtikiya(gerda) gramî / molekül ağırlığı  
**Gran (pref.)** / heb, hebik, lib, libik / tane, tanecik  
**Grand (adj.)** / mezin, gewre, hemiyatî / büyük, genel  
**Grand (adj.)** / serek, sereke / ana, esas  
**Grand (pref.)** / mezin / büyük  
**Grandchild (n.)** / newe, nevî / torun  
**Grandfather (n.)** / baphîr, kgal(ik) / dede, büyük baba (babanın babası)  
**Grandgrand child (n.)** / nevîçîcirk / torunun torunu  
**Grandmother (n.)** / dapîr, pîrik / anne anne  
**Graniform (adj.)** / şêweheb, dirbeheb, dirbedanik / habbe şeklinde, tane şeklinde  
**Granting (n.)** / dan / verme, bahşetme  
**Granular (adj.)** / savarkirî, danikî, hebî, hebikî / tanecikli, tane tane olan, taneli  
**Granulate (v.)** / danik kirin-bûn, hebî kirin-bûn / tanellemek, tanelenmek  
**Granulated (adj.)** / hebgirtî, bihebik, bilib, riskyan / taneli, tanelenmiş, tane haline getirilmiş  
**Granulation (n.)** / danikbûn / granülasyon, tane tane olma, tanelenme  
**Granule (n.)** / danik, hebik / granül, tanecik, tane, habbe  
**Granulite (adj.)** / danikî / taneciksel  
**Granuloma (n.)** / danikpejî, pejbûna danikî yan dëndikî / granülom  
**Granulose (adj.)** / savarî, danikî / taneseli, tane gibi  
**Grape (n.)** / tirî / üzüm \*  
**Graph (n.)** / nexşek, hêla diyarkirinê hincekirina peyîvê / grafik, çizge  
**Graphic(al) (adj.)** / nexşek(y)î, nexşekirî, wênekirî, wêneyî, çapî / grafiksel, çizgesel  
**Grass (n.)** / gîha, giya, çêr, pincar, lewer / ot, yeşillik  
**Grassy (adj.)** / bi giya, giyadar / otlu, yeşillikli

**Grate (v.)** / renandin, rende kirin, rêşke kirin / rendelemek

**Gratify (v.)** / kêfxweş kirin, dilxweş kirin, dilşad kirin, têrî kirin / memnun etmek, tatmin etmek

**Gratifying (n.)** / kêfxweş kirindar, têrîdar / memnun edici, tatminkâr

**Grave (adj.)** / giran, girîng, tirsnak, tewa / vahim, ağır, ciddi, şiddetli /

**Grave disease** / nexweşiya giran, nexweşiya tewa / ağır hastalık, ciddi hastalık

**Gravi (pref.)** / giran / ağır

**Gravid (adj.)** / avis, ducanî / gebe

**Gravidity (n.)** / ducanîti, avistî / gebelik

**Gravimeter (n.)** / giranpîv / ağırlık ölçer

**Gravimetry (n.)** / giranpîvî, sengpîvan / ağırlıklölçümü

**Gravitate (v.)** / hatin kêşan, livîn (bi kêşanê) / yer çekimi ile çekilmek, çekilmek, çök(el)mek, çekilerek hareket etmek

**Gravitation (n.)** / rakêşan, kişan, erdkêşîkirin / yer çekimi gücü, gitme, yönelme

**Gravitational (adj.)** / erdkêşî / yerçekimsel

**Gravitational (adj.)** / kêşanî, rakêşanî, erdkêşîkirinî / yer çekimi ile ilgili

**Gravitational eczema** / bîrova erdkêşî / yerçekimsel ekzema

**Gravitative (adj.)** / erdkêşîçêbûndar / yerçekimi ile oluşan /

**Gravity (n.)** / erdkêşî, giranî / ağırlık, yerçekimi

**Gravity (n.)** / rakêşan, metirsî, girîngî / ağırlık, ciddiyet, şiddet, önem

**Gray haired** / porspî, serspî / beyaz saçlı

**Gray matter** / daringa xwelîgon / gri madde, külrenginde madde (beyinde) /

**Gray, grey (n.) (adj.)** / reşik, gewr, axkî, boz, reşboz, xwelîgon, cûn / gri, kurşuni, kül rengi (maviye çalan beyaz)

**Grayness (n.)** / xwelîgontî / grilik /

**Grease (n.)** / bez, don, rûn, dûv / yağ (katı, hayvansal) /

**Grease (v.)** / rûn kirin / yağlamak

**Greasy (of food) (adj.)** / çivirdar / yağlı

**Great (adj.) (adv.)** / mezin, mest, gewre, gir(s) / büyük

**Great care** / pûte ya mezin, bayexa mezin / büyük bir özenle, büyük itina /

**Great extent** / eşkêlek mezin, modineyek mezin / büyük çapta /

**Great grand father** / bavê bapîrî / dedenin babası

**Great imitator** / lasakerê-zehrkerê-razekerê-remzkerê-zarîkerê-zarvekerê mezin / büyük taklitçi /

**Greatest (adj.)** / herî mest, mezintirîn / en büyük

**Green (adj.) (n.)** / kesk, sewz, kerik, şînî, jînî, hêşîn / yeşil

**Green jaundice** / nesaxê çermkeskî, zerika kesk / derinin yeşil olduğu sarılık

**Greenery (adj.)** / keskî, hêşînayî, şênayî / yeşil olma, yeşillik

**Greenish (adj.)** / keskoî / yeşilimsi

**Greenness (n.)** / keskî, hêşînayî, keskayî / yeşil renklilik

**Greensickness (n.)** / nexweşiya kesk / klorosis, genç kadınlarda kansızlığa bağlı yeşil görünümlü hastalık /

**Greenstick fracture** / şikestina dara therr / küçük çocuklarda yaç ağaç kırığı /

**Grey, gray (adj.), (n.)** / cûn, xwelîgon / gri, kül rengi /

**Grieve (v.)** / kesirîn, kedirîn, keribîn, ber ketin / üz(ül)mek

**Grill (v.) (n.)** / biraştin, biraştî / ızgarada pişirmek, ızgara

**Grind (v.)** / zîqandin / gıcırd (t) mak

**Grind, digest (v.)** / hêrandin, hêran, vehêrandin, hêrtin / öğütme

**Grinding (n.)** / hêrandin, hêran, vehêrandin, hêrtin / öğütme /

**Groin (n.), inguinal (adj.)** / golim, pizî, berran / kasık

**Groove, gutter (n.)** / çiraneke, çirtonek, çirik, çirtik, şurriklûlik, şirrînek, çoratan(g), loç, kelş, edet, kevdek / oluk, yiv

**Grooved (adj.)** / çiraneke / yivli, oluklu

**Grooving (n.)** / çiranekekirin / oluk yapma

**Groovy (adj.)** / biçiraneke / oluklu

**Gross (adj.)** / girs, mezin, dilreq, dilhişk, têkre, eşkera, dîtîni, leşdarî, sirûşî, seretayî, kirêt, têkreyî / kaba, makroskopik, bol, iri, büyük

**Gross (n.)** / sinêde, gizrekî, tantroskî / kabataslak, kabaca

**Gross blood** / boşxwîn (bi qasî çav dibîne) / bol kan (gözle görülecek kadar) /

**Grossly (adv.)** / bidîtbûnî / makroskopik olarak /  
**Ground (n.)** / ax, bej, erd, bin, binyat, nîşte, rastik, bingeh / yer, zemin, altta yatan neden  
**Ground glass (n.)** / cama qeşa, pîpoka cemed / buzlu cam /  
**Groundless (adj.)** / bêhîm, bêbingeh, bêsedem / temelsiz  
**Group (n.)** / girûh, bend, kom, birr, tof, cêrge, gişkek, qewte, kewte, komel, komele, telp, cêrgekom / grup, küme  
**Group (v.)** / kom bûn, polên kirin, kom çêkirin, kirin koman; kom bûn, civîn / gruplandırmak, sınıflandırmak  
**Grow (v.)** / gih(a)îştin, gihandin, xwedî kirin / yetişmek, yetiştirmek  
**Grow (v.)** / mezin bûn, xwedî kirin / büyümek, yetiştirmek  
**Grow (v.)** / mezin kirin / büyütme, xwedî kirin  
**Grow (v.)** / werar bûn, mezin bûn / gelişmek  
**Grow (v.)** / zaûzé bûn, zêde bûn, çar bûn / üremek, çoğalmak  
**Grow older (adv.)** / çaxa kgu mezin-kgal dibin / yaşlandıkça, yaşlanırken, büyüdükçe  
**Grow smaller (adv.)** / çaxa kgu çûk dibe / küçüldükçe  
**Grow up (v.)** / mezin bûn, gihâştin / büyüme, olgunlaşmak /  
**Grow-get old** / mezin bûn, phîr-kgal bûn / büyüme, yaşlanmak  
**Growing (adj.)** / mezindar, werardar, pirrdar / büyüyen, gelişen, çoğalan  
**Growing (n.)** / mezinbûn, pirrbûn, çezirandin, lixwedan, werarbûn, şînbûn, çandin, werzkirin, perestên, resiyayî, şînbûyî, lixwedayî, geşinde / büyüme, gelişme, çoğalma  
**Growing pains** / êşên mezinbûnê-werarbûnê / büyüme-gelişme (dönemi) ağrıları /  
**Grown (up) (adj.)** / mezinbûyî, gihîştî, gihâştî / yetişmiş, büyümüş /  
**Grown up (adult) (n.)** / mezin, gihîştî / büyük, yetişkin kimse \*  
**Growth (adj.)** / bûyîn / oluşum  
**Growth (n.)** / mezinbûn, mestbûn, girsbûn, gihîştîn, pêşketin, zêdebûn / büyüme, gelişme

**Growth (n.)** / zaûzé, geşedanî, civirîn, kelbengî, kawdan / üreme, büyüme  
**Growth promoting hormones** / hormone kgu piştigiriya mezinbûnê dikin / büyümeyi destekleyen hormonlar /  
**Growth, development (n.)** / werar, werarbûn, pêşketin, peresîn / gelişme  
**Grumbling, restless, discontented (n.) (adj.)** / şilejan / tedirgin  
**Guard (v.)** / parastin, sitirandin / korumak, savunmak / dive bijîşk xwe ji radyasyonê biparéz e.  
**Guess, estimate (v.)** / hezr kirin, vezanîn, pêşbînî kirin, rawêjandin, gumankirin, zenkirin / tahmin etmek  
**Guess, estimate, conjecture (n.)** / hezr, rawêj, vezanîn / tahmin, varsayım  
**Guide (n.)** / rêber, berbîn, pêşdar, rêzan, pendiyar, rûkir, raber, pêşber, rênas / kılavuz, rehber  
**Guide (v.)** / araste kirin, rêberî kirin, raberî kirin, rê nîşan dan / yönlendirmek, kılavuzluk etmek, sevketmek, sürmek /  
**Guideline** / rêber, rênas, kurtî (rêbaz yan ramyarî) / yol gösteren  
**Guilty (adj.)** / tawandar / suçlu  
**Guinea pig** / kobay / qobay  
**Gulp (v.)** / daqurtandin, gulpandin (rayek kurdî û inglîzî yek e) / yutkunmak  
**Gum (n.)** / pidî, pidû, pû, stirk, çesp, getîre / diş eti  
**Gum (n.)** / şîrêz, deb(m)ûş, şîrik, şîrqal / zank, yapıştırıcı  
**Gunshot wound** / birîna gulleyê, birîna çeka / kurşun yarası, silah yarası  
**Gush (v.)** / pijiqîn, beliqîn, fiziqîn, lîzikîn, vizikîn / fışkırmak  
**Gustation (n.)** / tamkirin, sehkera tamê, çêjkirin, çêjtin, jêçêştin, çêjandin, çêstin / tatma, tadına bakma  
**Gustative (adj.)** / tamdar, çêjdar / tat ile ilgili  
**Gustatorial (adj.)** / tamdar / tatla ilgili  
**Gustatory (adj.)** / tamî, çêjî / tat, tatsal, tatma duyusu ile ilgili  
**Gusto (n.)** / tam, çêj / tat, tatma  
**Gut (n.)** / dirb, bihurk / geçit  
**Gut (n.)** / jih / kiriş  
**Gut (n.)** / jih, tence / hayvan bağırsaklarından yapılan ip

**Gut**, intestine (n.) / p'izûr, rodî, rovî, ûr rêvî, rûvî, hûr / barsak  
**Gutta (n.)** / dilopek / bir damla /  
**Guttate**, guttated (adj.) / şêwedilop, dirbedilop / damlaya benzer /  
**Gutter**, groove (n.) / çiraneke, çirtoneke, çirik, çirtik, şurriklûlik, şirrîneke, çoratan(g) / oluk  
**Guttural (adj.)** / qirikî, gewrikî / boğazsal, gırtlak ile ilgili  
**Gyn(o) (pref.)** / jin, hêkdank / kadın  
**Gynaec(o) (pref.)** / jin / kadın  
**Gynaecological (adj.)** / jinnasekî / kadın hastalıklarına ait /  
**Gynandromorph (adj.)** / nêremok / erkeksilik niteliklerini taşıyan dişi /  
**Gynandromorphism (n.)** / jinane, duregezî, nêremok / dişinin erkeksilik özellikleri taşıması, çift cinsiyetlilik /  
**Gynandrous (adj.)** / nêremok / karma eşeyli, karma cinsiyetli  
**Gyne (suff.)** / jin, mê, hêkdank / kadın, dişi, yumurtalık  
**Gynecologist (n.)** / pijîşkê jinan, jinnexweşzan / kadın hastalıkları uzmanı  
**Gynecology (n.)** / jin nexoşîzanî, jin nesaxîzanî / kadın ve doğum hastalıkları bilimi  
**Gyniatrics (n.)** / jinnexweşîzanî / kadın hastalıkları bilimi /  
**Gyr(o) (pref.)** / xelek, çemere, lole / halka  
**Gyrate (adj.)** / badayî, zivirî / dönmek, helezoni, yuvarlak, zemberek şeklinde, dairesel /  
**Gyrate (v.)** / zivirîn, zîz bûn / kendi eksenini etrafında dönmek  
**Gyrated (adj.)** / zivirî / dönmüş  
**Gyrating (n.)** / zivirandin / dönme  
**Gyration (n.)** / zivirinî / dönüş, dönme, deveran  
**Gyrator (n.)** / zivirok / dönen, devreden, dönücü  
**Gyratory (adj.)** / zivirokî, badayî / dönme, devretme işi  
**Gyre (n.)** / livîna çemereyî, şiklê çemereyî / dönüş, dönme, deveran, daire şekli  
**Gyrus (n.)** / xelekên mejî / beyin kıvrımları, beyin halkaları

## H

**H(a)emagglutination (n.)** / hem pëvzeliqandin / h(a)emaglutinasyon, hemyapıştırma /

**H(a)emal (adj.)** / xwînî / kanla ilgili

**H(a)emal (adj.)** / xwînî / kansal, kana ait /

**H(a)ematemesis (n.)** / xwînverşîn / kan kusma

**H(a)emati (n.)** / madeyek şîn-reş bêşikil din av hexmoglobînî de

**H(a)ematic (adj.)** / xwînî / kanla ilgili, kanı etkileyen ilaç

**H(a)ematic (adj.)** / xwînî, xwîndar / kanlı

**H(a)ematin (n.)** / sebaxa şîtelbûna hîemoglobînî / hêmâtîn

**H(a)emato, h(a)emato (pref.)** / xwîn / kan

**H(a)emato, h(a)emato (pref.)** / xwîn / kan

**H(a)ematochesia (n.)** / xwîna bigû / kanlı dışkı

**H(a)ematogenous (adj.)** / xwînçêker, xwînzê, xwînwî / kan yapıcı

**H(a)ematology (n.)** / xwînzânî / kan bilimi

**H(a)ematoma (n.)** / bergez, pejbûna xwînê, xwînpejî / hematoma /

**H(a)ematopoiesis (n.)** / çêbûna xwînê, xwînçêbûn / kan oluşumu

**H(a)ematopoiesis, erythropoiesis, sanguinopoiesis (n.)** / xwînçêkirin, xwînsazî / kan yapımı

**H(a)ematozoon (n.)** / mişexwerê xwînê, xwînmîşexwer / kan paraziti

**H(a)ematuria (n.)** / xwînmîzî / idrarda kan, kan işeme

**H(a)ematuria (n.)** / xwînmîzî / kan işeme, idrarda kan

**Habilite (v.)** / xwedî bûna rengê (çawani yên) pêwîst / gerekli niteliklere sahip olmak

**Habit (n.)** / cir / huy

**Habit (n.)** / hûreyî, hînbûnî, kurm, adet, banek / alışkanlık

**Habit forming (adj.)** / kurm pêkanî, dibe adet / alışkanlık meydana getiren

**Habitat (n.)** / nêvenga xweristî (cihê taybetî yê bûn an mezinbûna tiştekî) / doğal ortam

**Habitual (adj.)** / adetî, banek(î), hînbûnî, sirûşî, beng, banînbûyî, fêrbûyî, hobûyî, hutbûyî, hîmbûnî / alışılmış, mutad, adet haline gelmiş, alışkanlıkla ilgili

**Habitual (adj.)** / timî, yê hertim (li ser wateya hîbûnê) / sürekli (alışılmış anlamında)

**Habitual abortion** / ji berçûna banînbûyî, beravêtina 'elimîn, beravêtina hînbûyî / alışılmış düşük

**Habitually (adv.)** / bi adetî, bi kurmî \*alışıldığı şekilde, adet üzere /

**Habitualness (n.)** / adetîtî, kurmîtî / alışkanlık, adet, mutad oluş

**Habituation (n.)** / adetkirin, kurmkirin / alıştırma, alışkanlık haline getirme /

**Habitude (n.)** / adet, kurm / adet, alışkanlık /

**Habitude (v.)** / adet kirin, kurm kirin / alıştırmak, alışkanlık haline getirmek /

**Haem, heme (n.)** / pêkhatiyek sor asin tède ye kgu parçeya ne protîniya gilobînî ye / hem

**Haemoglobin (n.)** / xwînsorî, rengkerê pirtikên sorên xwînê / hemoglobin

**Haemolysis (n.)** / xwînhiîn, nemana xwînxaneyên sor dinav hemoglobînî de / hemoliz

**Haemolytic (adj.)** / xwînhiînî / hemolitik

**Haemophilia or hemophilia (n.)** / xwînverestin (SS) / hemofili

**Haemoptysis (n.)** / kilmûçxwîn, lîçika bixwîn / kanlı balgam, balgamla karışık kan tükürme

**Haemorrhage, hemorrhage (n.)** / risîn, xwîn(î)bûn, xwîn jê hatin, xwînverestin, riskîn, xwînarîbûn, xwînkişîn, xwînjêçûn, xwînbûn / kanama /

**Haemorrhage, hemorrhage (n.)** / risîn, xwînbûn, xwîn jê hatin / kanama /

**Haemorrhoid or hemorrhoid (n.)** / mayesîr, basûr / basur

**Haemostasis (n.)** / xwînwestar, rawestana rewanî yan çûna xwînê / hemostaz

**Haemostatic (adj.)** / xwînrawestî, rawestaniya xwînê / hemostazla ilgili

**Hair (n.)** / por, mû, pirç, pûrt, qij / saç, kıl

**Hair brush** / rineka por, fırça por (not: fırça ji pirçê tê)\* saç fırçası

**Hair dresser (n.)** / kurgurker / berber

**Hair line (n.)** / xêza por / saç çizgisi

**Hair remover** / pordervan / kılları döken ilaç

**Hair restorer** / porxwedîker / saç besleyen ilaç



**Haircut (n.)** / kğurkirin (por), jêkirin / saç kesmek, saç tıraşı  
**Hairless (adj.)** / bêpor, gurrî, keçel / kel, saçsız  
**Hairpin, hairgrip (n.)** / berbisk, toqa por / saç tokası  
**Hairy (adj.)** / bi mû, bi pirç, bi pûrt / saçlı, kıllı  
**Half an hour** / nîv demjimar / yarım saat  
**Half bred** / dureh, duliqî, kestel, sorryaz, zir (EK) / melez  
**Half completed (v.)** / nîvçe, nîçvekirî / yarılama  
**Half length** / nîvbejn, ji navê berjor / göbekten yukarı  
**Half moon** / pazne, heyva nîvî / yarım ay  
**Half moon like** / wek hîvanîvî, wek pazne / yarım aya benzer  
**Half way** / nîvê rê, nîvçe / yarı yolda, işi tamamlamadan  
**Half, semi, hemi (n.) (adj.) (adv.)** / nîv, nêvî, nîvçe, nîvco, nîwe, kaye, jin, nore, nîvî, nîvek(î) / yarı, yarım  
**Halfblood (n.)** / melez / melez  
**Halfblooded (adj.)** / melezî / melez olmuş  
**Halitosis (n.)** / bêhnexoşiya mirovî, bîngenî ya hilmijê / pis kokan nefes  
**Hallmark (n.)** / nîşan, taybetiya veqetîner, taybetî / ayırıcı özellik, işaret  
**Halluces (n.)** / tilîkên nig ê yekem / ayak baş parmakları  
**Hallucinate (v.)** / pêşrew hatin ber cava, sepet jê re çêbûn, pêşrew dîtin, sepet jê re çêbûn / sanrıla(t)mak, halüsinasyon görmek, gördüğünü sanmak  
**Hallucination (n.)** / pêşrew, sepet, rewrewk, şipestayî, virave, fişar / sanrı, varsam, varsanı  
**Hallucinative, hallucinatory (adj.)** / pêşrewî, rewrewkî / sanrı kabilinden /  
**Hallucinogen (n.)** / dermanê şipestayî, pêşrewker, rewrewker, pêşrewzê, rewrewkzê / sanrı yapan ilaç  
**Hallucinogenic (adj.)** / pêşrewker, rewrewker, pêşrewzêdarî, rewrewkzêdarî / sanrı yapan /  
**Hallucinosi (n.)** / rewrewkçêbûn, şipeste, eletewş / sanrı getiren hastalık /  
**Hallux (n.)** / pêçî, bêçî / ayak baş parmağı  
**Halo (n.)** / xelek, xêlî, zerzeng / hale, halka

**Hamster (n.)** / giyanewerek kirinde wek cirdî ye (hamster) / cırlak sıçan  
**Hand (n.)** / dest, destik, lep / el  
**Handful (adj.)** / mist, kulm / avuç  
**Handicap (adj.)** / ziran, neqeb, asteng, qop, elîl, dixel / engel, mahzur, dezavantaj, özürlü, sakat  
**Handicapped (adj.)** / qop, zirandar / sakat, özürlü, mahzur  
**Hang down, hang loosely, lean out (v.)** / dahelîn, şiqitîn, pañçilîn, daşindilîn, şor bûn, daleqîn, daşindilîn, dewliqîn / sarkmak  
**Haphazard (adj.) (adv.)** / kinemine, kerambera, serabera, serobero, çawalêhato, tûşhatî, eletexmîn, rasthatinî, rasthatî, lêrasthatinî / gelişigüzel, rastgele (plansız, programsız)  
**Hapl(o)(pref.)** / yek, sade / bir, sade  
**Haploid (adj.)** / xaneyaya yekrengkerî / yarı kromozomlu (hücre)  
**Happen (v.)** / bûn, pêk bûn / olmak, vuku bulmak /  
**Harass (v.)** / bêzar kirin, zivêr kirin, qerihandin, aciz kirin, zebirandin, canzerî kirin / usandırmak, bezdirmek, tedirgin etmek, taciz etmek /  
**Harbo(u)r (v.)** / hewandin, vehewandin, hêwirandin, penihandin, hemilandin / barındırmak  
**Hard (adj.)** / giran / ağır / guhê wî giran e  
**Hard (adj.)** / sıkı / jidiyayî  
**Hard (adj.)** / tahl, no, tûj / acı  
**Hard (difficult) (adj.)** / sext, pitew, tep, zirk, wuşk, dijwar, qayim / zor, güç /  
**Hard auditi (v.)** / guhgiran / ağır işiten  
**Hard chancre** / pizika req, reqepizik / sert şankır  
**Hard mass, solid mass, rigid mass** / reqegirse, girse ya req / sert kitle  
**Hard of hearing** / guhgiran, giran bihîstin / ağır işitme  
**Hard palate (anat.)** / ezmanê dev, kama dev, panika dev / sert damak  
**Hard, firm, rigid, stiff, solid x (soft) (adj.)** / req, hişk, pitew, betîn (x nerm) / katı, sert (xyumuşak) / girse bi dest danê hişk bû, ne avî bû (bi wate ya dijî nermî)  
**Hard, severe, violent, impetuous (adj.)** / tund, tewa, hişk, bitund, biqurs, bigiranî, giran, gij / şiddetli, ağır, sert, ciddi /

**Harden (v.)** / req bûn, hişk kirin / sertleş(tir)mek, katılaşt(tır)mak  
**Hardened (n.)** / reqkirî-bûyî / sertleşmiş, katılmış  
**Hardener (n.)** / reqker / sertleştirilen, katılaştırıcı  
**Hardening (n.)** / hişkîti, reqîti, reqî / sertleşme, zorluk  
**Hardly (adv.)** / bi dijarî, bi zor(ê), zorbela, hişkî / zorlukla, sert bir şekilde  
**Hardness (n.)** / hişkîti, reqîti, reqî, çetinîti, pitewî / çetinayâ, dijarî, hişkî /  
**Hardship (n.)** / dijarî / sıkıntı, güçlük, zorluk  
**Harelip (n.)** / lévkeriş / tavşan dudak, yarık dudak  
**Harlequin (n.)** / zirtek / palyaço  
**Harlequin fetus** / pitika zirtek / palyaço bebek  
**Harm (n.)** / xisar, ziyan, azar, zarar, xirabî, êş / zarar  
**Harm (v.)** / xisar dan, xerabî (pê) kirin, êşandin, azardan / zarar etmek, tahrip etmek  
**Harmful (adj.)** / ziyandar, ziyandar, bi zarar, bixisar / zararlı /  
**Harmfully (adv.)** / bi ziyandarî / zarar verecek şekilde, zararlı olarak  
**Harmfulness (n.)** / ziyandarîti / zararlılık  
**Harmless(adj.)** / bê ziyan / zararsız  
**Harmlessly (adv.)** / bi bêxisarî / zararsız bir şekilde /  
**Harmlessness (n.)** / bêxisarîti / / zararsızlık /  
**Harmonious (adj.)** / ahengdar, lihevker; guncandî, gurivandî, hevkeş, lihev, lihevhatî, rikibandî, hevsaz, yekaheng / uyumlu, ahenkli  
**Harmonious, concordant, compatible (adj.)** / lihev, ahengdar, hevsaz, yekaheng, lihevhatî, guncandî, gurivandî, hevkeş, rikibandî / uyumlu, ahenkli  
**Harmoniously (adv.)** / bi ahengî, bi li hevkerî, rikibandî / uyumlu olarak, ahenkli bir şekilde /  
**Harmonize (v.)** / ahengdar kirin-bûn, li hev kirin / uyum sağlamak, uyumlu olmak  
**Harmony (with) (n.)** / li hev kirin, ahengdar bûn, aheng, lihevkerin.\* uyum, ahenk, uygunluk  
**Harsh breath (n.)** / hêzzenpişîn / kuvvetli sounum sesleri  
**Hastate (adj.)** / dirûvrîm, dirberim, dirbenize / mızrak başı biçiminde

**Hasten (v.)** / lez kirin-bûn, dan lez kirin / acele et (tir) mek  
**Hastily (adv.)** / bilezî / aceleyle /  
**Hasty (adj.)** / lezker / aceleci  
**Hate (v.)** / Bîz kirin, zehl kirin, kerx kirin, kift kirin / nefret etmek  
**Haunch, hip (n.)** / kemax, hengil, qurk, kgulêmek, qorik, tilor, simt, girde, laqûn, qormatix, onc / kalça, kalça eklemi  
**Haunch, hip (n.)** / onc, qorik, kemax / kalça  
**Haunchbone, hipbone (anat.)** / hestiyê qorikê / kalça kemiği  
**Haunchbone, hipbone (n.)** / / hestiyê kemaxê, hestiyê qorikê / kalça kemiği, leğen kemiği  
**Have a fever (v.)** / ta girtin / ateşli hastalığa yakalanmak  
**Have a tooth out** / diran rakirin / diş çektirmek  
**Have a tooth pulled** / diran rakirin / diş çektirmek /  
**Have an epileptic fit** / bidayê ketin / sarası tutmak  
**Have cancer, become cancerous** / bûn şêrpençe, bûn şêrpençawî / kanser olmak  
**Have difficulty** / ze'hmet kişandin, dijarî kişandin / güçlük çekmek  
**Have experience** / bûn xwedî cerriban-hêçan-telesî-ezmayîş / tecrübe sahibi olmak /  
**Have one's doubts** / k'etin şikê / şüpheye düşmek  
**Have one's hair cut** / porê xwe jê kirin-kgur kirin / saçını kesmek  
**Have the measles, have the rubeola** / sorik derxistin / kızamık çıkarmak  
**Have to (v.)** / bégav bûn, neçar bûn, diviyat man / zorunda olmak  
**Have to, must (n.)** / gerek, pêviyayî, pêtivî, pêwîstî, divê, pêwîst, viyan, lazim / -meli, -malı  
**Have you heard it?** / deng hat te? Te bihîst? / ses geldi mi? İştittin mi?  
**Having (n.)** / derbaskirin / geçirmek  
**Having internal hemorrhage** / xwînîbûna hinavî derbas kirin / iç kanama geçirmek  
**Having no appetite, stomachless (n.)** / bêbijî, nebijî, dilneçûn / iştahsız  
**Hazard (n.)** / helketin, samnakî, xetere / tehlike /  
**Hazard (v.)** / serkêşî kirin, şêrûdî kirin, kirin xeterê; wêrîn, avêtin xeterê / tehliye atmak

**Hazardous (adj.)** / xeternak, bixisar, zîyandar / tehlikeli, rizikolu, zararlı

**Hazardously (adv.)** / bi xeternakî / tehlikeli olarak /

**Hazardousness (n.)** / xeternakîti / tehlikelilik /

**Hazy (adj.)** / xûmamdar, şolî, mijdar\* puslu, sisli, bulutlu, bulanık

**He (pron.)** / ew / o

**Head (n.)** / serî, ser / baş

**Headache (n.)** / serêş, serêşan, janeser, derdeser, jana serî / başağrısı

**Headband (n.)** / dersoka serî / kafa bandı

**Headdown (n.)** / bernexûn, serberjêr, devnexûn / baş aşağı

**Headed (adj.)** / bi serî, serî / başlı

**Headshrinker (n.)** / derûnsaxker / psikiyatrist /

**Heal (v.)** / baş kirin, derman kirin / iyileştirmek

**Heal (v.)** / qenc bûn, baş bûn; rehet bûn, sax bûn (birîn, hwd) / iyileşmek, şifa bulmak /

**Healable (adj.)** / saxbar / iyileşebilir /

**Healing (n.)** / rehetbûn, saxbûn / iyileşme

**Health (n.)** / jûnî, bijûnî, noş, xweşî, saman, saxî, sihet, tendurustî / sağlık

**Health good** / saxbûn, saxlemî / sağlıklı olma durumu

**Healthful (adj.)** / saxlem, bijûn / sağlığa yarayışlı, sağlıklı

**Healthily (adv.)** / bibijûnî, bi saxlemî, saxlemîkî / sağlıklı bir şekilde

**Healthiness (n.)** / bijûnî, xweşî, başî / sağlıklılık

**Healthy (adj.)** / tendurust, saz, sax, bijûn, pît, xweş, baş / sağlam, sağlıklı

**Heap (v.)** / kom bûn / kümele (n) mek

**Hear (v.)** / bihîstin, deng hatin-çûn(guh), guncandin, (lê) guhdarî kirin / işitmek, duymak /

**Hearing (n.)** / bihîstin / işitme, işitim /

**Hearing aid** / bihîstok / kulaklık, işitme cihazı

**Hearing defect** / 'udra bihîstinê / işitme bozukluğu /

**Heart attack (n.)** / qeyrana dil, dilwestan, thengezariya dil / kalp krizi

**Heart collapse** / dilrûxîn, dilhelişîn / kalp çöküşü-açmazı

**Heart disease** / nexweşîya dil / kalp hastalığı

**Heart failure** / netêriya dil, dilnetêrî, diltênekirinî / kalp yetmezliği

**Heart palpitation** / pitpitîna dil, diltepîna dil, dilperpetok, dildupdupîn / kalp çarpıntısı, kalbin hızlı atması

**Heart transplant ( )** / dilguhastin / kalp nakli /

**Heart volume** / sewta dil / kalp sesi

**Heart, cor (n.)** / dil / kalp

**Heartbeat (n.)** / hilavêtina dil / kalp atışı

**Heartbeat (n.)** / pirtepirt, dilqutan, avétina-lédana dil, tepîna dil / kalp atımı-atışı-vuruşu

**Heartburn, pyrosis (n.)** / dilsojî, dilsotin, berşoş(j)k, sotina serdil / mide ekşimesi-yanması /

**Heartburning (n.)** / dilsotin / göğüste yanma (refluye bağı)

**Heartdissect (v.)** / dilk(q)eliştin, diljêkûfelqe kirin / kesip parçalara ayırmak, parçalayıp incelemek, kadavrayı incelemek

**Heartscanner** / dilbîn, dillêgerîner, dilnihêrîndar / kalp skeyni

**Heat, warmth, temperature (n.)** / germî(a), germahî, germayî, kel, taw, thî(ê)n, girr, germi / ısı, sıcak(lık), vücut ısısı

**Heat, Warm, Hot (n.)** / germ / sıcak

**Heat (v.)** / germ kirin / ısıtmak, ısınmak / girave, piştî li hev xistinê tê germ kirin /

**Heat exhaustion (n.)** / ro lèxistin / sıcak çarpması

**Heated (adj.)** / germkirî / ısıtılmış

**Heater (n.)** / germker, ağırdan / ısıtıcı

**Heating (n.)** / germkirin / ısıtma

**Heavily (adv.)** / bi tundî, bi qursî, bi giranî / şiddetli bir şekilde, ağır bir biçimde

**Heaviness (n.)** / giranî / ağırlık, şiddet (hastalığın)

**Heavy (adj.)** / qurs, giran, seng, bitund, biqurs / ağır, ciddi, aşırı, şiddetli

**Heavy (adv.)** / bi giranî, tundkî / ağır şekilde, şiddetle

**Hebetic (adj.)** / xortûqîzanî / gençlikle ilgili, püberte ile ilgili

**Heedless (n.)** / nebaldar / dikkatsiz

**Heel (n.)** / panî, kabik (a solan), piştpanî, paşpanî, pajine, piştpehnî / topuk

**Heel bone** / hestiyê panîyê / topuk kemiği

**Height (stature) (n.)** / bilindahî, berzî; bejn, bejn û bal qam / boy /

**Heighten (v.)** / bilind kirin-bûn, zêde kirin-bûn / yüksel (t) mek, art (tır) mak

**Helic(o) (pref.)** / loleyî, pêçî, pêçoke, lefandî / helezon, sarmal

**Helical (adj.)** / loleyî, pêçeyî, çeççeçokî, xelîsî, lefandî / helezonî, sarmal  
**Helically (adv.)** / bi pêçokeyî, bi gerpêçeyî / helezon şeklinde, sarmal şekilde /  
**Helicoid (adj.)** / pêçekokî, lefandokî / sarmal, helezonî  
**Helio (pref.)** / roj / güneş  
**Helios (n.)** / lêdana tavê yan rojê, tavgez / güneş çarpması  
**Heliotherapy (n.)** / çarekirin bi tîrêja rojê / güneş ışınları ile tedavi  
**Heliotrope (n.)** / xemrîyê vekirî, binevşê vekirî / açık mor  
**Heliotrope rash** / rijka binevşê vekirî / heliyotropik raş  
**Helix (n.) (anat.)** / serçimika gûh / dış kulak kenarı  
**Helix (n.)** / pêç, badoke, gerînok, pêçoke / sarmal eğri  
**Helminth (n.)** / kirm, nemaze kirmê ûrkî / barsak solucanı, kurt  
**Helminthiasis (n.)** / derdê khurmên mişexwer / helmitlerin neden olduğu hastalıklar  
**Helminthic (adj.)** / kgurmên mişexwerî / solucana ait /  
**Helminthology (n.)** / kgurmzanî, kirmzanî (mişexwer) / helmint bilimi  
**Help (n.)** / harîkirin, yarmetî, piştîvanî, harîkarî, destgirtin, firya, alîkarî, harî, arî, parîde, yarîdedan, hevarî / yardım  
**Help, aid, assist (n.)** / alîkarî, arîkarî, yarmetî / yardım, destek  
**Help, assist, aid (v.)** / alîkarî kirin-dan, arîkarî kirin, harî kirin, yarmetî dan, yarmetî kirin, arîkarî kirin, alî kirin / yardım etmek  
**Helper (n.)** / alîkar / yardımcı  
**Helper, aide, assistant (n.)** / alîkar, arîkar, berdest, yarîdeder, hevpişt, harîker, yawer, piştîvan, destgir / yardımcı  
**Helpful (adj.)** / alîkar / yardımcı  
**Helpful (adj.)** / kgêrhatî, havil / faydalı, yararlı  
**Helpfully (adv.)** / bikgêrhatî / faydalı bir şekilde /  
**Helpfulness (n.)** / bikgêrhatîyî / işe yararlılık /  
**Helping (n.)** / alîkarîkirin\* yardım etme /  
**Helpless (adj.)** / bêçare, bêgav, bêhavil, neçar / çaresiz

**Helpless patient** / nexweşên bé derman / çaresiz hastalar  
**Helplessness (n.)** / bêçareyî / çaresizlik  
**Hem-, hemo- or h(a)ema- (pref.)** / xwîn / kan  
**Hematoxylin eosin stain** / gona hematoqsîlen eosin / hematoksilen eozin boyası /  
**Hemi (pref.)** / nîv e / yarı  
**Hemialgia (n.)** / nîvserêş / yarım başağrısı  
**Hemiplegia (n.)** / nîvfallincî, nîvşehtî, nîvşilî / yarım inme, vücudun sadece bir tarafına gelen felç  
**Hemispherical, hemispheric (adj.)** / nîvgogî / yarı küremsi, yarı küreye ait /  
**Hemisphere (n.)** / nîvgog, nîvkad / yarı küre  
**Hemoglobin (n.)** / rengê xwînê / hemoglobîn  
**Hemolytic (adj.)** / xwîherijînî, xwînulînî / kan parçalanmasına ait  
**Hemolysis (n.)** / xwînherijîn, şanexwîn herijîn, xwînletebûn / kan hücrelerinin parçalanması  
**Hemolysis (n.)** / xwînihilîn / hemoliz, kan eritme (parçalama) /  
**Hemolytical (adj.)** / xwînihilînî / hemolitik  
**Hemophilia (n.)** / nexoşiya riskîna xwînê / hemofili  
**Hemophile (adj.) (n.)** / xwînxwaz, xwînxwazî / kan isteyen-seven  
**Hemophiliac (n.)** / mirovê xwînriskîn, (y)ê kgu xwedî xwînriskîn / hemofilisi olan  
**Hemophilic (adj.)** / (y)ê xwînxwazî / kan isteyeme-sevmeye ait  
**Hemopoetic (adj.)** / xwîncêker, xwînnavakî, xwînnavaker / kan yapıcı, kan meydana getiren  
**Hemoptisis (n.)** / pişikxwînriskîn, kilmûçxwîn derxistin, xwînekilmûç / kanlı balgam çıkarma, hemoptizi, kanlı balgam  
**Hemorrhage, haemorrhage (n.)** / risîn, xwîn(i)bûn, xwîn jê hatin, xwînverestin, riskîn, xwînarîbûn, xwînkişîn, xwînjêçûn, xwînbûn / kanama /  
**Hemorrhagic (adj.)** / xwînîbûnî, xwînarîbûnî, xwînjêçûnî / kanamalı, kanamaya ait  
**Hemorrhoid(s) (n.)** / babasîl, bawesîr, pêsor / basur

**Hemorrhoidal (adj.)** / bawesîrî, pêsorî / basura ait /  
**Hemostasis (n.)** / westarî ya xwînê, xwînewestârî, pengexwîn / kan durgunluğudurğanlığı, kan durgunlaşması  
**Hemostat (n.)** / riskînbirr, xwînverestînbirr / kanamayı durdurma  
**Hemostatic (adj.) (n.)** / riskînbirr(î) / kanamayı durduran-durdurucu  
**Hemotoxic (adj.)** / xwînjah'rî, jah'riya dijî xwînê / kan hücrelerine karşı zehirlenme  
**Hence (adv.)** / ji vir, ji vira, ji vir de, ji niha pê ve, jî vir pê ve / şu andan itibaren  
**Hence (adv.)** / jiber vê yekê / bunedenle, bundan dolayı, dolayısı ile /  
**Heparin (n.)** / cergîn / heparin  
**Heparinization (n.)** / cergîneyîkirin / heparinizasyon  
**Heparinize (v.)** / bi cergînê çare kirin / heparinize etmek  
**Hepat(o) (pref.)** / cerg, kezeb / karaciğer  
**Hepatic (adj.)** / cergî / karaciğere ait  
**Hepatitis (n.)** / cergkgulî, kgulbûna kezeba reş, cergkgulî, kgezbebguliya reş / hepatit, karaciğer iltihabı  
**Hepaticization (n.)** / Cergîbûn / karaciğerin renk ve kıvamını alması /  
**Hepatomegaly (n.) (adj.)** / cergegîrbûn, gîrbûna cergê, cergegîrbûn, mezinbûna kezeba reş, mestcergî / karaciğer büyümesi  
**Hepatosplenomegaly (n.)** / cergûfatreşkgîrbûn / karaciğer dalak büyümesi  
**Her (pron.)** / ji wê re / onu, ona  
**Her (pron.)** / ya wê / onun  
**Herald (n.)** / saloxdar, peyamnêr / haberci  
**Herald (v.)** / salox dan / haber vermek, habercisi olmak, öncülük etmek  
**Heralding (n.)** / haydar / haber veren / pêşhestî (aura), berjengiyeye kgu saloxdar dayê dike / epilepsiyi haber veren bir semptomdur /  
**Herb (n.)** / giya, gîha / ot  
**Herbage (n.)** / hêşinahî, giya, şînkayî / yeşillik, ot  
**Herbal (n.) (Adj.)** / giyayî / otlara ait, bitkisel  
**Herbalist (n.)** / giyazan / bitkilerle tedavi eden

**Herbicide (adj.)** / giyakgujî / bitkileri öldüren ilaçla ilgili  
